Şarkiyat İLMİ ARAŞTIRMALAR DERGİSİ
JOURNAL OF ORIENTAL SCIENTIFIC RESEARCH (JOSR)
Cilt/Volume: 16, **Sayı/Issue:** 02 (Aralık / December 2024)

ÎMAJA EWROPA Û EWROPİYAN Dİ PEYWENDA OKSÎDENTALÎZMÊ DE Dİ BERHEMÊN FERHAD PÎRBAL DE

Mehmet Şirin Filiz
Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı,
mehmetsirinfiliz@gmail.com , ORCID: 0000-0003-0622-5510

İbrahim Tarduş
Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı,
ibrahimtardus1@gmail.com, ORCID: 0000-0002-8292-0921

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 28/02/2024
Accepted / Kabul Tarihi: 28/12/2024
Doi: 10.26791/sarkiat.1507988

Îmaja Ewropa û Ewropiyan di Peywenda Oksîdentalîzmê de di Berhemên Ferhad Pîrbal de

Kurte

Oksîdentalîzm herçend wekî dîsîplîneke akademîk berevajîkirina oryantalîzmê bê dîtin jî di rastiyê de hewldana fêmkirina Rojavayê ye. Digel vê yekê oksîdentalîzm li gelek deverên cuda yên cîhanê ji ber sedemên dîrokî û civakî formên cuda girtiye. Oksîdentalîzm li gor oryantalîzmê nêzîkahiyeke nû ye ku di nava rexneya edebî de tê bikaranîn. Sedema sereke ya vê yekê ew e ku oksîdentalîzm hêj jî di nav guherînê de ye. Oksîdentalîzm di edebiyatê de di fêmkirina yên din de amûreke gelekî giring e, ji ber ku problema xwebûnê û yên din gelek caran di edebiyatê de hatiye vekolan. Di edebiyata kurdî de problema xwebûnê û yên din bêtir di çarçoveya dîtina serdestan de bûye mijar. Lêbelê wekî şêweyeke dîtina yên din li ser îmaja Ewropayê û ewropiyan xebat tunene. Ji vî aliyî ve ev xebat dil dike ku dest nîşan bike ka li derdora nîqaşên oksîdentalîzmê îmaja Ewropayê û ewropiyan di berhemên Pîrbal de çawa hatiye bikaranîn. Di encamê de hatiye dîtin ku di berhemên Pîrbal de hem aliyên neyînî û hem jî aliyên erênî yên îmaja Ewropayê û ewropiyan hene. Ewropî ji hêlekê ve wekî kesên kolonyalîst, emperyalîst, bêruh û oryantalîst hatine teswîrkirin; ji hêlekê ve jî ew wekî kesên ku huner û zanistê pêş ve birine hatine destnîşankirin.

Peyvên Sereke: Oksîdentalîzm, Oryantalîzm, Kolonyalîzm, Ewropa û Ewropî, Ferhad Pîrbal

Oksidentalizm Bağlamında Ferhad Pîrbal'ın Eserlerinde Avrupa ve Avrupalı İmajı

Öz

Oksidentalizm bir akademik disiplin olarak oryantalizmin tersi olarak görülse de özünde Batı'yı anlama çabasıdır. Bununla beraber oksidentalizm dünyanın farklı coğrafyalarında birçok tarihsel ve toplumsal nedenden dolayı farklı biçimler almıştır. Oksidentalizm, oryantalizme nazaran edebiyat eleştirilerinde kullanılan daha yeni bir yaklaşımdır. Bunun temel nedeni bir düşünce biçimi olarak oksidentalizmin halen değişip dönüşmekte olan bir ideoloji olmasıdır. Bununla beraber oksidentalizm edebiyatta ötekilik sorununu anlamada kullanılabilecek önemli bir araçtır; çünkü benlik ve ötekilik sorunu edebi yapıda sıklıkla işlenmektedir. Kürt edebiyatında benlik ve ötekilik sorunu daha çok Kürtlerin egemen ulusları görme biçimi olarak işlenmiştir. Ancak bir ötekini görme biçimi olarak Avrupa ve Avrupalı imgesinin bu edebiyatta nasıl işlendiği üzerinde yeterince durulmamıştır. Bu açıdan bu çalışma, oksidentalizm tartışmalarından yola çıkarak Ferhad Pirbal'ın eserlerinde Avrupa ve Avrupalı imgesinin nasıl işlendiğini göstermeyi amaçlamaktadır. Sonuç olarak görülmüştür ki Pirbal'ın eserlerinde Avrupa ve Avrupalı imajının hem olumlu hem de olumsuz yönleri bulunmaktadır. Avrupalılar bir yandan kolonyalist, emperyalist, ruhsuz ve oryantalist olarak resmedilirken bir yandan da sanata ve bilime katkısı olan kişiler olarak gösterilmişlerdir.

Anahtar Kelimeler: Oksidentalizm, Oryantalizm, Kolonyalizm, Avrupa ve Avrupalılar, Ferhad Pîrbal

In the Terms of Occidentalism Europe and European Image in the Works of Farhad Pirbal

Abstract

Although Occidentalism as an academic discipline is seen as an inverted form of orientalism, it is essentially an effort to understand the West. However, Occidentalism has taken different forms in different areas of the world due to many historical and social reasons. Occidentalism is a more recent approach used in literary criticism compared to Orientalism. The main reason is that Occidentalism, as a way of thinking, is an ideology that is still changing and transforming. However, it is also an important tool for understanding the problem of otherness in literature, as the issue of self and otherness is frequently addressed in literary works. In Kurdish literature, the problem of self and otherness is primarily addressed in the context of viewing dominant nations. However, the way Europe and the European image are portrayed in this literature has not been sufficiently emphasized. In this respect, based on discussions on Occidentalism, this study aims to show how the image of Europe and Europeans is treated in Ferhad Pirbal's works. As a result, it is seen that the image of Europe and Europeans in Pirbal's works has both positive and negative aspects. On one hand, Europeans are portrayed as colonialists, imperialists, soulless, and Orientalists; on the other hand, they are described as contributors to art and science.

Keywords: Occidentalism, Orientalism, Colonialism, Europe and Europeans, Farhad Pirbal

Destpêk

Problema yên din ango yên ku ne ji me ne ji demên kevnare ve heye. Em gelek caran mirovên din wekî ku ne ji me û nebaş pênase dikin. Bo nimûne li gor yewnaniyan yên din hemû barbar bûn, li gor rûmiyan jî etruskî barbar bûn. Mirov her dem ji xwe re kesên din ava dikin û ev yek heya serdema modern jî berdewam dike. Ev yek problemeke sereke ya felsefeyê jî bû. Bo nimûne, ji Platon û Parmenîdes bigirin heya kesên wekî Husserl û Habermas li ser vê problemê hûr bûne. Freud ji aliyê psikolojîk ve û Marks jî ji aliyê sosyolojîk ve li ser vê mijarê sekîniye. Lê dibe ku yê ku herî zêde li ser vê problemê sekiniye Hegel e. Wî hewl daye ku vê problemê di berhema xwe ya navdar *The Phenomenology of Spirit* (*Fenomenoljiya Hiş*) de çareser bike (Kearney, 2012, 15-21). Li gor wî însan dixwaze bibe biker, lewra cihana ku ew tê de dijî dixwaze bi kirinên xwe biguherîne û derdikeve rêwîtiyekê. Di vê rêwitiya xwe de insan rastî kesên din tê û di encama vê yekê de şerê di navbera du bikeran de dest pê dike ku ew vî şerî wekî "Diyalektîka Kole û Efendiyan" pênase dike (Hegel, 1986). Ev rewş gelek caran di metnên edebî de jî tê dîtin. Lewra Girard (2013, 101-102) bi şêweyeke Hegelrew îddîa dike ku di metnên edebî de herçend em û yên din biguherin jî bi awayên cuda ev problem derdikeve pêşberî me.

Di edebiyatê de problema yên din parçeyekî xebatên îmajolojiyê ye. Lê berî ku em derbasî îmajolojiyê bibin, divê behs bikin ka îmaj di edebiyatê de tê çi wateyê. Îmaj ango îmge di hişmendiya mirovên kevnare de cihekî giring digirt ku ew yek di serdema modern de jî berdewam dike. Lewra îmaj parçeyekî giring ya hişmendiya mirovahiyê ye (Eliade, 1992, 12). Îmaj herçend zêdetir di helbestê de bê bikaranîn û têgeheke nezelal be jî, bêtir di wateya metafor û zimanê figuratîv de tê bikaranîn. Mirov dikare bibêje ku îmaj bîr û baweriyên mirovan yên li ser objeyan e. Îmaj kapasiteya hiş e ku di derbarê objeyan de hin wêneyan ava dike. Ew sînonîma bêjeya fantazî ye, ji ber vê ye ku ew berevajiya rastiya objeyan, avakirina fantaziyên li ser objeyan e (Baldick, 2001, 122). Li gor Baudelaire îmajînasyon di rastiya xwe de cîhaneke nû diafirîne ku ev teybetmendiyeke xweser a hunermend e. Hunermend ne tenê ew kes e ku tiştên heyî kopî dike, di heman demê de ew kes e ku bi rêya îmajînasyonê cîhaneke nû diafirîne (Lenoir, 2002, 77). Lê digel îmajên ku di helbestê de têne bikaranîn di xebatên îmajolojiyê de îmaj tê wateya têgihiştineke derbarê komek an gelekî de. Bi gotineke din îmaj ew tişt e ku temsîla milletekî di hişê milletekî din de ye. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku îmaj bi karakter û taybetmendiyên gelekî ve girêdayî ye. Bo nimûne fransiz nazik in, alman hezkiriyê azadiyê ne, îngilîz sîyasetmedar in û hwd. Ev îmaj ji aliye sosyolojîk û psikolojîk ve têne avakirin û di nav pêvajoya dîrokê de dikarin biguherin. Lê ev rastiyek e ku her gelek derbarê gelên din de xwedi îmajan e (Leerssen, 2007).

Weku berê jî hat behskirin, problema yên din ji bilî îmajolojiyê di zanistên civakî de bi taybetî jî di felsefe û sosyolojiyê de problemeke sereke ye. Lê ev problem bi taybetî bi rêya oryantalîzm û oksîdentalîzmê bûn dîsîplînên serbixwe. Herçend ew her du disiplîn wekî disiplînên dijberî hev xuya bikin jî li gor Said (2013, 343) oksîdentalizm ne mecbûr e ku bibe dijberê oryantalizmê. Lê em dikarin bibêjin ku ev her du têgeh ne bi tevahî dijwateyê hev bin jî bi hevdu re têkildar in û sînorê hev diyar dikin (Massad, 2015). Bo nimûne; li gor oksîdentalîzmê çawa ku oryantalîstan hewl dida ku Rojhilatê pênase bikin, divê rojhilatiyan jî bi awayekî zanistî Rojava pênase bikira. Ev raman bêtir ji hêla Hasan Hanefî ve hatiye parastin. Oksîdentalîzm li gor wî bersiveke pozîtîf ya ereban ji bo pênasekirina Rojavayê bû. Wî bi taybetî bi pirtûka xwe ya bi navê *Muqaddima fi ilm al –Istighrab (Destpêkek Ji Bo Zanista Oksîdentalîzmê)* hewl daye ku oksîdentalîzmê rave bike. Wî dixwast bi rêya oksîdentalîzmê çandeke rewşenbîriyê di nav ereban de bide destpêkirin. Lewra digot ku heya niha em ji Rojavayê hîn bûn, lê divê êdî em Rojavayê pênase bikin û derbarê wê de agahiyan hilberînin (Tonneson, 1993, 17).

Dema ku mirov li niqaşên li ser oksîdentalîzmê binhêre, mirov bi hêsanî dikare bibêje ku ev têgeheke ne zelal e. Lewra pênasekirinên gelek ji hev cuda û heta dijberî hev yên oksîdentalîzmê jî hene. Bo nimûne mirov dikare behsa oksîdentalîzma çînî, oksîdentalîzma îslamî, oksîdentalîzma tirkî, heta oksîdentalîzma sosyalist jî bike (Metin, 2020, 196). Lê tiştên ku van oksîdentalîzmên cuda digihijîne hev, ew e ku her oksîdentalîzmek ji çavê civaka xwe Rojavayê dibîne û wê pênase dike. Di vê çarçoveyê de têgihiştinên cuda yên oksîdentalîstan xwe di metnên edebî yên cîhanê de jî nîşan didin. Bo nimûne di romana Halide Edip ya bi navê *Ateşten Gömlek (*Îşlîkê *Ji Agir)* de îngilîz û amerîkî xwedî îmajeke neyînî ne (Engin, 2012, 60). Bi heman awayî weku Salhi (2019, 46) jî destnîşan dike îmajeke erênî ya Rojavayê di edebiyata erebî de jî tuneye. Îmaja rojavayiyan di edebiyata îranê de guherbar e. Bo nimûne di serdema Şah de di edebiyata îranê de Rojava cihekî baş û warê şaristaniyê bû. Lê di serdema Humeynî de ev îmaj guherî û Fransa wekî şeytanê biçûk hate dîtin, şeytanê mezin jixwe Amerîka bûye (Laetitia, 2013, 95-97).

Heger em ji bo edebiyata kurdî biaxivin, mirov dikare bibêje ku herçend hin xebatên li ser îmajolojiyê yên wekî Îmaja *Ermenî di Romanên Kurdî Yên Sovyetê de y*a Kanê (2019) û *Mehmet Uzun Romanlarında Türk İmgesi (*Îmaja *Tirkan di Romananên Mehmet Uzun de)* a Göktaş (2022) hebin jî ji bilî xebata Bavli Özek (2021) ya bi navê *Self-Oryantalîzm An Jî Oksîdentalîzm?: Temsîla "Rojava" ("Occident") di Fîlmên Kurdî de* li ser îmaja ewropiyan di ede-

biyata kurdî de xebatek nehatiye kirin. A rast gelek sedemên cuda yên vê yekê hene. Lewra di navbera civaka kurdan û ewropiyan de têkiliyeke rasterast pêk nehatibû. Ji ber vê jî em di nav edebiyata kurdî zêde rastî îmaja ewropiyan nayên. Lê edebiyata dîasporayê, îstîsnaya vê yekê ye, ji ber ku nivîskarên dîasporayê rastî çanda Ewropayê hatibûn û vê yekê bandor li ser edebiyata wan jî kiribû. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku Ferhad Pîrbal di nav edebiyata kurdî de yek ji wan kesan e ku herî zêde cih daye jiyana Ewropayê û kesayetên ewropî di berhemên xwe de. Ji ber vê sedemê armanca vê xebatê ew e ku di cihana edebî ya Ferhad Pîrbal de îmaja Ewropa û ewropiyan dest nîşan bike. Di vê xebatê de ji bilî berhema wî ya bi navê *Reîs Remezan(ekan)* xebatên wî yên ku li kurmancî hatine wergerendin, di çarçoveya nîqaşên li ser oksîdentalîzmê de dê bên analîzkirin. Me *Reîs Remezan(ekan)* li derveyî vê xebatê hişt, lewra di vê berhemê de Ewropa û ewropî tune.

1. Oksîdantalîzm: Dîtina li Ser Rojava û Rojavayiyan

Oksîdentalîzm herçend ketibe nav xebatên rexneya edebî jî hêj jî têgeheke nezelal û nesabît e. Li gelek welatên cîhanê şikl û formên cuda digire (Ning, 1997). Lê mirov bi giştî dikare bibêje ku oksîdentalîzm îdeolojiyek e ku hewl dide Rojavayê pênase bike. Li gor oksîdentalîzmê Rojava ji aliyê çandî û siyasî ve yekpare ye. Lê ev wêneya Rojava guherbar e, carinan pozîtîf û carinan jî negatîf e. Ji ber vê jî gelek oksîdentalîzmên ji hev cihê derketine holê (Jouhki û Riekka Pennanen, 2016, 4)

Li gor Carrier (1992) oksîdantalîzm ew tişt bû ku berevajîyê oryantalîzmê Rojava pênase dikir; wekî oryantalîzmê, oksîdentalîzm jî pêvajoyeke diyalektîk û dînamîk bû. Ango çawa ku Rojhilatek tekane tunebe, Rojavayek tekane jî tuneye û ne mimkûn e hebe jî.[1] Li gor Ahiska (2010, 5-6) jî oksîdentalîzm têgeheke nezelal e, lê ev nezelaliya vê têgehê bi xwe tiştekî baş e, lewra ji ber vê nezelaliya xwe ew dê bibe amûreke bikêrhatî. Ji ber ku oksîdentalîzm dîtîna li ser Rojavayê ye û di vê ditînê de jî gelek tiştên ji hev cuda hene. Mirov di nav van dîtinan de dikare Ewropaya kolonyal jî û navenda şaristaniyê jî bibîne. Salhi (2019, 47) van dîtinên cuda yên oksîdentalîzmê bi giştî bi sê awayan dabeş dike:

- Hezkirina li hember Rojavayê
- Rika li hember Rojavayê
- Nezelaliya li hember Rojavayê; di navbera hezkirin û rikê de

Metin (2013, 66-68) kategorîzasyonên Salhiyî dipejirîne û ew wan têgihiştinên cuda yên oksîdentalîzmê wekî tabloya jêr formûle dike:

Tablo 1 Senifandina Oksîdentalîzmên Cuda (Metin, 2020, 193)

Nerîn	Pênasekirina Oksîdentalîzmê	Oksîdentalîst	Nûnerên Sereke	Têgihiştina Navend û Perîferiyê	Têgihiştina Yên Din	Têgihiştina Cîhanê
Nêrîna 1.	Erênî. Çawa ku mafê Rojavayê heye ku li ser Rojhilatê bixebite mafê Rojhilatê jî heye li ser Rojavayê bixebite. Oksîdentalîzm xweparastin ya Rojhilatê li hember Rojavayê ye.	Tenê rojhilatî	Hasan Hanefî	Armanc ne anîna Rojhilatê bi navendê ye, bêtir avakirina dengeyeke di navbera Rojhilat û Rojavayê de ye.	Taybetiyên yên din guherbar in	Rojhilat û Rojava wekî parçeyekî hevpar yê şaristaniyê ne
Nêrîna 2.	Neyinî. Oksîdentalîzm bi pêşdaraziyan têkilhev e. Ew dijminahî û şerê li hember nirxên Rojavayê ye.	Hem Rojavayî hem jî Rojhilatî.	Ian Buruma Avishai Margalit.	Avrupa-Navendî (Euro- Centric). Rojava di navendê de Rojhilat di perîferiyê (periphery) de ye.	Yên din ji aliye ontolojik ve naguherin.	Tenê Rojava û yên mayî.

1 Ji bo awayên cuda yên oksîdentalîzmê binêrin (Carrier, 2003)

Nêrîna 3.	Erênî. Oksîdenalîzm ev tişt e ka gelo mirov çawa dikare nirxên Rojavayê pêş ve bibe.	Hem Rojhilatî hem Rojavayî.	Couze Venn.	Ewropa-Navendî (Euro-centric).	Sentezek Ewropa û di navbera yên din de.	Rojava û Rojhilat avakirina blokek berfireh di navbera wan de.

Nûnerê nêrîna yekemîn Hasan Hanefi ye. Wî hewl da bi awayekî zanistî pênaseya hişmendiya Ewropayê bike (Elsherif, 2015, 624). Li Gor Hanefi (2004) Rojava ji bo xetereyên li ser xwe berteraf bike dijminan ava dike û li gor vê gotarê divê ev dijmin jî Rojhilat be. Lêbelê li gor wî di eslê xwe de ev herdu çand ne pir durî hev in, heta di navbera van çandan de gelek tiştên hevpar hene. Heya niha oryantalîst, ji ber ku hêzdar bûn, wan Rojhilat pênase dikir; Rojava kirde û Rojhilat jî bireser bû. Lê êdî dor hatiye ser Rojhilatê. Rojhilatî jî êdî dikarin li ser Rojavayê biaxivin û wê pênase bikin û di derbarê wê de agahiyan hilberînin. Ev yek guhestina oryantalîzmê ber bi oksîdentalîzmê ve ye ku ev ji bo her du cîhanan jî tiştekî baş e. Lewra bi saya oksîdentalîzmê Rojava jî dikare li ser xwe bifikire û bibîne ka Rojhilatî çawa li wê dinihêrin.

Li gor nêrîna duyemîn ku nûnerê vê nêrînê Buruma û Margalit in, oksîdentalîzmê bi konferansa Kyotoyê dest pê kiribû. Di vê konferansê de rewşenbîrên japonî îddîa dikirin ku ew dijberî modernîteyê bûn. Modernîte herçend têgeheke nezelal be jî li gor Buruma û Margalit (2004, 1-5) tiştên ku ev rewşenbîr dijberî wê bûn, ne modernîte bû, ew dijminê Rojavayê bûn. Lewra li gor wan modernîteya Rojavayê aqil û nirxên Rojavayê temsîl dikir. Vî eqlê Rojavayê rihê japoniyan xera dikir û divîyabû li hember vê yekê gelê japon li ber xwe bidana. Rojava kapitalîst bû, takekesî diparast û di heman demê de ji bo gêlên Asyayê dihat wateya kolonyalîzmê jî. Ji ber van sedeman e ku Buruma û Margalit vê îmaja neyînî ya ku dijminê Rojavayê çêkiribû wekî oksîdentalîzm pênase kir.

Nûnerê nêrîna sêyemîn Couze Venn (2000) e. Ew di pirtûka xwe ya bi navê *Oksîdentalîzm Modernîte û Xweyîtî (Occidentalism Modernity and Subjectivity*) de li ser parçebûna çanda Ewropayê sekiniye. Li gor wî divê çanda modernîteyê ango çanda Ewropî bi pêş ve bê birin. Modernîte di nav krîzekê de ye û em bi rêya pêşvebirina çanda Ewropayê dikarin ji nav vê krîzê derkevin. Oksîdentalîzm ji bo vê yekê amûreke giring e, ango bi argûmanên oksîdentalîzmê modernîte dikare bê têkûzkirin.

Ji bilî van sê cureyên giştî yên oksîdentalîzmê, oksîdentalîzmên gelek cuda jî hene. Her gel xwedî oksîdentalîzmeke cuda ye, heta mirov dikare bibêje ku oksîdentalîzma her gelekî jî di nav pêvajoya demê de dikare biguhere. Nimûneya herî berbiçav ya vê yekê jî tirk in. Li gor Ahiska (2010, 15-18) nimûneya Tirkiyeyê gelek balkêş e, li gor wê oksîdentalîzm di heman demê de rê dide ku mirov têkiliyên di navbera Rojava û Rojhilatê de analîz bike. Bi taybetî jî di navbera çanda Rojhilat û Rojavayê de mirov dikare bi saya oskîdentalîzmê têkiliyên hêz û hêzdariyê fam bike. Lewra ev têgeh dibe amûreke baş ku mirov têkiliyên di navbera osmanî û ewropiyan de fam bike. Ji ber ku Împaratoriya Osmaniyan di navbera Rojava û Rojhilatê de pirek bû. Ev jî dibû sedem ku di hişmendiya osmaniyan de têgihiştinên tevlihev derkevin. Wan ji hêlekê ve xwe wekî parçeyekî Ewropayê didîtin û dixwestin hem ji aliyê Rojavayê ve û hem jî ji aliyê Rojhilatê ve bên qebûlkirin. Ev rewşa taybetî ya Tirkiyeyê dibû sedem ku rewşenbîrên tirkan hem bixwazin bibin Ewropî û hem jî bixwazin wekî xwe bimînin. Lewra Ewropa di hişmendiya rewşenbîrên tirkan de hem sembola modernîteyê û pêşveçûnê bû hem jî xwedî îmajeke kolonyalîst bû (2010, 186). Ji ber van yekan mirov dikare bibêje ku oksîdentalîzma tirkan xwedî du aliyan bû; ji hêlekê ve tirk heyranî çand û hunera Ewropayê bûn û ji hêla din ve jî ew ji ber aliyê kolonyalîst yê Ewropayê dijminê wê bûn. Em van yekan di gotara oksîdentalîstê yekemin Ahmet Mithat Efendî de dibînin. Bo nimûne li gor Findley (1998, 30) di hişmendiya Ahmet Mithat de Rojava xwedî îmajeke erênî ye. Herçend di serdema wî de îmajeke kolonyal ya Ewropa hebe jî li gor wî kesên wekî Madam Gulnarê îmaja erênî ya Ewropayê temsîl dikir. Ew keseke zana bû, bi gelek zimanan dizanî û qîmet dida çanda Rojhilatê jî. Herçend Ahmed Mîthad Efendî di şexsê Madam Gulnarê de heyranê Ewropayê be û çanda rojavayê bi civaka osmaniyan dabe naskirin jî li gor Yavuz (1998, 71) wî dixwest wekî rojhilatiyekî bimîne, lewra ji aliyê rewşenbîriyê ve dijberiya çanda rojavayê dikir.

Vê nakokiyê di serdema Tirkiyê de jî berdewam kiriye. Erê tirk heyranê çanda rojavayê bûn, lê rojavayîbûn ji ber ku wekî teqlîda Rojavayê dihate dîtin li Asyayê ne tiştekî muteber bû. Lê rewşa tirkan îstîsnaya vê yekê ye. Bo nimûne Gökalp ku bandoreke mezin hem li rewşenbirî û hem jî li siyaseta tirkan kiriye, di vê meseleyê de cuda difikire. Li gor Gökalp divê berê tirkan li Rojavayê be. Lewra li gor wî tirk bixwe parçeyekî Ewropayê bûn. Wan digel parastina çand û hunera xwe dikarî bibûna parçeyekî Ewropayê. Wî vê teza xwe jî wiha formule kir. Tirkbûn, misilmanbûn û medenîbûn ango rojavayîbûn (Bonnett, 2004, 63-76). Berevajî tirkan oksîdentalîzma ereban bêtir li ser dijminahiya Ewropayê hatibû avakirin. Îmajeke nerênî ya Ewropa û Amerîkayê heye di nav cîhana ereban de. Mohammed (2015, 167) di xebata xwe de diyar dike ku ev îmaj piştî bûyera Yazdehê Îlonê betir derketiye pêş û bi dagirkirina Iraqê bêtir berbelav bûye. Ji sinemayê bigirin heya berhemên edebî Amerîkî û Ewropî wekî kesên dagirker hatin teswîrkirin. Ew

xaçperest bûn ku li hember misilmanan şer îlan kiribûn.

Japonya di nav nîqaşên oksîdentalîzmê de nimûneyeke balkêş e; oksîdentalîzm li vir dest pê kiribû; lê êdî ev welat jî wekî parçeyekî Rojavayê tê dîtin. Lewra weke ku Coronil jî diyar dike, (1991, 54) Rojava ji erdnigariyek bêtir hişmendiyek û nêrîneke li cîhanê ye. Bo nimûne; heya sala 1945an dema ku Rojava dihat gotin bêtir Ewropa dihat fêmkirin, lê êdî navenda Rojavayê Amerîka ye. Îro Japonya jî bûye parçeyekî Rojavayê. Ji ber vê yekê ye ku Bonnet (2004, 15) dibêje herçend rojavayîbûn weki spîbûnê hatibe pênasekirin jî ev ne parametreya tekane ye çimkî di bingeha Rojavayê de saziyên polîtîk û civakî û hin nirxên ku li Rojavayê hatine avakirin hene ku çênabe ev nirx tenê ji aliyên etnîkî ve bên pênasekirin. Ji ber vê sedemê Buruma û Margalit (2004, 12) bi mafdarî dibêjin ku Japonya herçend cihê zayîna oksîdentalîzmê be jî niha oksîdentalîst wê jî wekî dijmin dibînin. Di encamê de em dikarin bibêjin ku herçend gelek cureyên oksîdentalîzmê hebin jî di nav pêvajoya demê de bi îhtîmalen ew ê hin oksîdentalîzmên nû jî derkevin.

Li derdora van nîqaşan heger em di çarçoveya vê xebatê de bifikirin ka gelo mirov dikare behsa oksîdentalîzmeke kurdan bike? Ev pirseke giring e ku em nikarin di vê gotarê de bibersivînin. Lê em dizanin ku nîqaşên li ser oksîdentalîzmê û dê ji bo gotara me bibin amûreke sereke. Lewra em dê di vê gotarê de li derdora van nîqaşan hewl bidin nîşan bidin ka Ferhad Pîrbal di berhemên xwe de Ewropa û ewropiyan çawa teswîr kiriye. Lewra wî gelek salên xwe li Ewropayê derbas kiriye. Wî doktoraya xwe ji Sorbonnê wergirtiye û ew li Danîmarkayê cîgirê sernûserê kovarên *Yakgirtin û Derwaza* bû. Digel nasnameya xwe ya akademîk ew wênesaz û aktor e jî. Ew mirowekî piralî ye û di berhemên xwe de îmaja Ewropa û ewropiyan bi kar aniye.

2. Ewropaya Emperyal û Kolonyal

Li gor Hanefî rola oksîdentalîzmê xelaskirina nasname û hebûna Rojhilatê ji bin desthilatdariya epîstemolojîk ya Rojavayê bû. Lewra ji vî aliyî ve oksîdentalîzma Hanefî parçeyekî dekolonyalîzasyonê bû (Metin, 2020, 187). Ji ber vê yekê ye ku rabêja oksîdentalîst di nav rewşenbîrên welatên cîhana sêyemîn de tê dîtin. Di vê mijarê de mirov dikare xebatên kesên wekî Albert Memmî The *Colonizer and the Colonized* (*Kolonyalîst û Kolonîzebûyî*), Abdelkebir Ketebî *the Tattooed Memory* (*Bîranîn Nîşankirî*), Frantz Fanon *Cihêliyên Cîhanê* (*Black Sin, White Mask And The Wretched of the Earth*) nîşan bide (Salhi, 2019, 26). Van rewşenbîran wêneyeke kolonyal ya Rojavayê nîşanî me didan. Sartre bal dikişîne li ser vê yekê û dibêje ku Fanon nîşanî me da ka gelo Rojava ji çavê yekî reşik çawa tê dîtin (Fanon, 2007, 9). Li gor Memmi (2003, 166) jî kolonyalistên Ewropî serdest bûn û gelên kolonîzekirî hewl didan bibûna wek serdestên xwe çimkî kolonyalîstan giyanê wan ji wan stendibû.

Ev rabêja antîkolonyal di nav nîqaşên oksîdentalîst de paşê guherî û rengekî cuda stand. Fanon li hember kolonyalîzma Ewropayê rexnegîrekî tûj bû, lê ev rabêj di destên îslamîstan de jî bû amûreke bêhempa. Îslamîstên radîkal Ewropayê wekî dîstopyayekê teswîr dikirin, li gor wan ev der maka xerabî û nebaşiyê bû. Rojava wekî webayekê ye ku ketiye nava laşê gelên misilman (Bonnett, 2004, 144-145). Oksîdentalîzm bi giştî di van demên dawî de bi Amerîkayê ve hate girêdan, lewra Amerîka dijminê gelên bindest bû. Ew alîkariya antîkomunîstan dike, Îsraîlê diparêze, IMF di destê wî de ye û hêzeke emperyal e (Buruma û Margalit, 2004, 8). Buruma (2004, 279) ji ber vê yekê dibêje ku bi taybetî piştî Yazdehê Îlonê hem di çavên çepgiran de hem jî di çavê îslamîstan de Rojava maka emperyalîzm û kolonyalizmê bû û divêt ji holê bihata rakirin.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku di çavên gelên rojhilat û cihana sêyemîn de îmajeke kolonyalist û emperyalist ya Rojavayê hebû. Lê ji bo kurdan ev rewş çawa bû? Gelo îmajeke kolonyalîst û emperyalîst ya Rojavayê hebû di nav kurdan de? Weku berê jî hatibû behskirin, em nikarin bersiva van pirsan bidin; lê em di berhemên Pîrbal de rastî vê rabêja rojavayiyên kolonyalîst û emperyalîst tên. Bo nimûne Parîs herçend bajarê romantîzmê be jî ji bo karakterê sereke yê *Santiago de Compestela* Dara ne cihekî baş e, ev der giyana wî dikuje. Fransa ne welatê wî ye û fransiz jî ne ewqas baş in. A rast îmaja fransizan bi giştî jî wisa bû. Bo nimûne Florack (2007) dibêje ku îmaja fransizan guherbar e. Fransiz mêvanperwer, arîstokrat û dewlemend in, digel van aliyên erênî ew şerûd, kolonyalîst û bîrokrat in jî. Parîs hem bajarê romantîzmê ye û hem jî bajarekî ku bi penaberan tejî ye. Di berhemên Pîrbal de jî îmajeke bi vî rengî heye. Bo nimûne di *Santiago de Compestelayê* de Dara kurdekî Helebceyî ye û mecbûr maye ku li Parîsê bibe penaber. Li welat şer heye û Dara mecbûr maye ku biçe Ewropayê, lewra heger neçe ew dê mecbûr bimane ku bibe leşkerê Seddam (Pîrbal, 2013, 14-15). Hevalên Dara ji wî re piştî bombebarana Helepceyê dibêjin ku ew dê li pêş NYê (Neteweyên Yekbûyî) konek vekin û dest bi greva birçîbûnê bikin, lê Dara dibêje ez nayêm. Ew di wê baweriyê de ye ku di navbera hikûmetên Ewropî de li ser kirinên Seddam lihevkirineke nepenî heye. Tenê derdê wan bazirganî ye û bi çalakiyên bi vî rengî dê gunehê fransizan bi kurdan neyê. Ew dê vegerin jiyana xwe ya berê û kurd ne di xema wan de bin. Jixwe ev şer ne Îran û Iraqê, lê Ewropa û Amerîka derxistiye. ewropî û amerîkî qehp in. Dara difikire ku

ew êdî nexwedî welatek e. Li bal Filip hevalekî wî heye. Ew ji van gotinên Dara aciz dibe û ji wî re dibêje ku ewropî û amerîkî ne qehp in, we rojhilatiyan ew dîktator hilbijartine. Dara ji wî re dibêje ku ew dîktator ne serokê wî ye, berevajî wî hemû ewropî û amerîkî li pişta wî diktatorî sekinîne da ku welatê wî kavil bikin û ji ber vê jî ew mecbûr maye ku li Ewropayê bibe penaber û êdî welatekî wî tuneye ku bikaribe vegere (67-68).

Weku ji van gotinên Dara tê fêmkirin ku li gor wî, kurd ne di xema ewropiyan de ne. Ji bo wan berjewendiyên wan giring in. Di heman demê de em îmaja kolonyal ya Ewropayê di *Hôtel Europeyê* de jî dibînin. Pîrbal di dawiya *Hôtel Europeyê* de nivîsandiye ku bûyerên di vê romanê de derbas dibin, bûyerên rasteqîn in û karaktarê bi navê Mr. Luciana heval û hevrêyê wî ye (Pîrbal, 2012, 205). Lê em hîn dibin ku Lucianayê ku di vê romanê de wekî mirovekî zana û hezkiriyê çanda rojhilatî tê pêşkeşkirin di eslê xwe de neviyê kolefiroşekî ye. Di sedsala 16an de piraniya welatên Efrîqayê di destên portûgaliyan de bûne. Bapîrê wî Deven Cohen çûye van welatan bi nirxekî erzan reşik kirîne û li Ewropa û Asyayê firotine. Wî daye pey François Xavier da ku ola xaçperestiyê li welatê Asyayê berbelav bike. Wî li Esfehanê cihû li derdora xwe kom kirine û sînagogek ava kiriye. Hemû çavkaniyên derbarê cihûyan de li Esfahanê li Beyt Lehmê kom kirine. Lewra ev der ji bo çand û hunera cihûyan gencîneyek e. Ev yek gelek bala Luciana dikişîne (87-89).

Berevajî Luciana, Hacîzade heye ku ew oksîdentalîstek misilman e. Li gor Hacîzade ewropî ji bo ku di demên teng de bikaribin bi kar bînin hemû gencîneyên xwezayî yên Rojhilata Navîn didizin û dixin depoyên xwe. Ji hêla din jî çi çek û sîlehên giran yên wekî top, napalm, firokeyên şer didin diktatorên rojhilatî da ku gelên rojhilatî li wê derê hev bikujin. Li gor wî, berpirsyarê birçîbûn û feqîriya Rojhilata Navîn ne gelên Rojhilata Navîn in, berpirsiyarê rasteqîn amerîkî û ewropî ne (Pîrbal, 2012, 64). Li gor Hacîzade Fransiz mirovên bêexlaq bêedelaet in. Ew guh nadin penaberan û wan wekî kêzikan dibînin (66). Herçend Hacîzade hin rexneyan li ser sîstema Îranê bike û ji ber vê sîstemê mecbûr mabe ku bibe penaber jî ew dîsa di wê baweriyê de ye ku sîstema Îranê di nav gelên misilman de sîstema herî baş e. Ew her dem bi misilmanbûna xwe û îranîbûna xwe serbilind e. Berevajî vê yekê ew ji hikûmeta Fransayê aciz e, lewra OFPRyê[2] gelek caran serdena wî ya penaberiyê red kiriye (18-19). Hacîzade, Cemaleddîn Efxanî wekî nimûne nîşan dide, li gor wî Efxanî ronesansa misilmanan daye destpêkirin (33). Efxanî di modernîzma misilmanan de roleke sereke lîstiye û wekî îslamîstê serdema modern jî tê zanîn (Aydın, 2017, 81). Efxanî di wê baweriyê de bû ku bi teknîkên rojavayî û bi exlaqê îslamê gelên misilman dikarî bi pêş ve biçûna. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku Hacîzade hemû rabêja oksîdentalîstan bi kar aniye, lewra ew hem ji Ewropa û ewropiyan hez nake hem jî dixwaze têkeve şûna wan. Di dawiya romanê de ji ber ku pir dişibe Luciana, ew ê têkeve şuna wî. Hacîzade digel ku qîmetê dide çanda îslamê û Îranê jî ji neçarî dibe pêlîstokê mêrekî fransiz. Ew mecbûr dimîne ku bi fransizekî kal û homoseksuel re bijî. Ew pir dewlemend e û ji bo her careke şabûna bi wî re 150 frank dide wî (Pîrbal, 2012, 104). Hacizade ji neçarî vê yekê qebûl dike. Lewra ew nikare debara xwe bike ew jî wekî gelek penaberan bûye pariyekî hêsan ji bo kalekî fransiz (108).

Di rastiya xwe de ne tenê ji bo Hacîzade ji bo hemû penaberên ku li vî welatê dijîn, jiyan ne baş e. Jixwe penaberî xaleke sereke ye di berhemên Pîrbal de (Ağdal, 2022). Parîs bi penaberan tije ye û tu qîmeta penaberan li vî bajarî tuneye (Pîrbal, 2012, 12). Bo nimûne; Luciana herçend mirovek baş be û alikariya Ferhad bike jî Ferhad baş dizane ku ew ji bo Luciana û diya wî ji bilî karmendekî ku di hotela wan de kar dike ne tiştekî din e (74). Ew hevalê Ferhad e; lê dîsa jî di wê baweriyê de ye ku Ferhad bi karê wênesaziyê mijûl bibe jî tu carî ew dê nikaribe bibe ewropî çimkî kurdek nikare ji aliye hunerî ve rikberiya ewropiyan bike (Pîrbal, 2012, 169). Ev yek gelek caran nîqaşên oksîdentalîst têne dîtin, ji ber ku ew wekî teqlîda Rojavayê tê dîtin û rojavayîbûn li Asyayê ne tiştekî muteber e. Bi gotineke din Asyayî dema ku bixwazin bibin rojavayî tenê dikarin bibin teqlîdeka xerab ya Rojavayê (Bonnett, 2004, 63-76). Di nav vê çarçoveyê de weku Salhî (2019, 95) jî îfade dike, herçend mirovekî rojhilatî gelek ji Rojavayê hez bike jî û her dem bixwaze bibe rojavayiyek jî ew dê tu carî nikaribe bibe mîna yekî rojavayî. Rewşa Ferhad jî kêm zêde wisa ye. Ew wekî penaberên din ji neçarî hatiye xwe li Ewropayê girtiye; lê digel aliye wî yê hunermendiyê jî nekariye bibe wekî ewropiyan. Jixwe ewropî bi êşa penaberan re ne eleqedar in, li gor Ferhad penaber ne di xema wan de ne. Li vê derê nijadperestî heye. Bo nimûne; Ferhad rastî endameke Jean-Marie Le Pen tê ku partiyeke nîjadperest e, ew jê re dibêje ku ji ber ku we dengê xwe daye Seddam Husên hûn bi xwe ji kirinên wî berpirsyar in. Ew di wê baweriyê de ye ku hem gelê Iraqê hem jî yên Îranê dengê xwe dane desthilatdaran û ew anîne ser kar (Pîrbal, 2012, 63).

Penaber di cîhana edebî ya Pîrbal de her dem darê şikestî ne. Bo nimûne; di çîroka *Penaber* de karakterê sereke ji ber ku Almanya mafê penaberiyê nedaye wî aqil diavêje û tevgerê şaşo maşo dike (Pîrbal, 2001, 43). Ew roj di hemû qenalên Almanyayê de behsa vî penaberî tê kirin (46). Di çîroka *Perawêzên Ewropayê* de Kurdo karakterê sereke ye. Li gor Kurdo penaber wekî kaxizên avêtî ne li Perwazên Ewropayê. Ewropa ji bo kesên wekî wan ne bihûşt bû. Di dawiyê de ew jî mecbûr dimîne ku bi pîrejinekê re bizewice (27). Em penaberên bêçare di *Santiago de Compestelayê*

2 Saziya serlêdana penaberiyê ya Fransayê ye.

de jî dibinin, jixwe penaberî koletiya hevdemî bû. Ewropa ji bo penaberan ne cihekî baş bû. Dara heft mehan li kampa penaberan li bajarê Oslo birçî û bê pere maye (Pîrbal, 2013, 11). Li Ewropayê nîjadperest jî hene ew penaberan difiroşin. Dara rastî mirovekî nîjadperest tê jê re dibêje ku tu çi difiroşî, mêrik dibêje ku ew japon û ereban difiroşe (Pîrbal, 2013, 84). Dema ku hûn li vî welatî penaber bin tu taybetmendiyên we li vî welatî bi kêr nayên. Bo nimûne Nuriyê belangaz ji Qamişloyê ye, ji diya xwe re gotiye, yadê ez diçim Parîsê doktoriyê dixwînim; lê ew jî bi ser neketiye. Ew sêzdeh sal in bi penaberî li Ewropa dijî, li pêşber baxê Luxemburg dikan vekiriye û rojnameyan difroşe (19-20).

Dîsa di çîroka "Şîzofren" de Bextiyar kurdekî Iraqê ye. Wî berê xwe daye Fransayê da ku endazyariyê bixwîne; lê di dawiya sêzdeh salan de nikare tu tiştekî bike û wekî penaber mecbûr dimîne ku li vî welatî xerîb bijî û di dawiyê de wî dişînîn şêtxaneyê (Pîrbal, 2001, 57). Di çîroka "Lamartîne" de karakterê sereke ji xwe re li kar digere; lê tenê pisporiya wî "Kafiye di Helbestên Lamartine de*"* ye ku ew pisporî bi kêrî tiştekî nayê. Lê ji bo ewropiyan ew taybetî bi kêrî tiştek nayê (36). Di encamê de mirov dikare bibêje ku di berhemên Pîrbal de îmajeke kolonyalîst û emperyal ya Ewropiyan heye ku ew penaberan li gor dilê xwe dikirin û difiroşin, li Rojhilata Navîn tevliheviyan derdixin û wekû tiştek nekiribin ji derve li bûyeran temaşe dikin. Ligel van aliyên neyînî yên Ewropa û ewropiyan aliyên wan ên baş jî hene. Ew jî pêşvebirina huner û zanistê ye.

3. Ewropaya Warê Zanist û Hunerê

Di bingeha oksîdentalizmê de hem heyraniya li hember Ewropayê hem jî nefreta li hember Ewropayê heye. Hem aliyê kolonyal ê Ewropayê heye hem jî Ewropa maka moderniteyê ye. Dijminên Rojavayê herçend kolonyalîzm û emperyalîzma Rojavayê rexne bikin jî di heman demê de qebûl dikin ku Rojava cihekî utopîk e û dergûşa şaristaniyê ye. Dîroka pêşveçûna mirovahiyê gelek tiştan deyndarê çanda rojavayê ye (Bonnett, 2004, 131). Ji ber van sedeman e ku kesên wekî Fukuyama (1989) îddîa dikirin ku di dawiya dîrokê de çanda rojava bi ser ketiye. Cihê dawî yê ku mirovahî bikare bigihîje qonaxa demokrasiya neo-lîberal e, ji ber ku ev cure demokrasî li hember awayên polîtîk yên din wekî marksîzm, komunîzm û sîstemên totalîter bi ser ketiye. Lewra Buruma û Margalit (2004, 72) di wê baweriyê de bûn ku oksîdentalîst, ne tenê ji ber ku Rojava sîstemeke alternatîf ya nirxan ava kiriye dijminê wê bûn, di heman demê de ji ber ku Rojava azadiya takekesî diparêze û qadeke bikomfor pêşkeşî mirovahiyê dikir dijminahiya wê dikirin. Di vê mijarê de di navbera oksîdentalîstan, dîndarên radîkal, sîstemên totaliter û kesên komunîteryen de hevalbendiyek heye. Lewra hemû jî di wê baweriyê de bûn ku nirxên ku li Rojavayê hatine hilberandin ji bo çanda wan xetere bûn. Lê digel van endîşeyan jî wan bi xwe jî dizanî ku Rojava ji gelek aliyan ve ji Rojhilatê pêşketitîr bû. Rojava xwedî rasyanolîte, saziyên demokratik bû û ji aliyê aborî, zanistî, hunerî û civakî ve gelek pêşketî bû (Turner, 2003, 45).

Li gor Huntington (1993, 39) bivênevê di navbera şaristaniyan de ji ber gelek sedeman şer û pevçûn hene. Lê di navbera van şer û pevçûnan de Ewropa şaristaniya herî bihêz e. Ew ji aliye leşkeri çandî, siyasî û aborî ve ji şaristaniyên din pêşketîtir e. Ewropa dikare hemû siyaseta cîhanê domîne bike û li ser navê gelên din biryarên sîyasî, çandî, aborî û leşkeri bigire. Li hember Ewropayê tu hezek nikare bisekine. Digel van yekan li gor kesên wekî Tonneson (1993) ne şert bû ku di navbera Rojhilat û Rojavayê de dijberiyek hebe. Ango mirovekî rojhilatî jî dikarî nirxên rojavayê biparêze. Nimûneya herî baş ya vê yekê jî Edward Said e; lewra ew ji aliye etnîkî ve ereb bû û li hember têgihîştina oryantalist têkoşiyabû, lê di heman demê de bi zanist û nirxên rojavayî ve perwerde dîtibû. Li gor Saîd (2016, 29-30) jî ew di navbera herdu çandan de bû. Hem aîdî herdu çandan bû hem jî ne aîdî tu deverê bû. Erê ew ereb bû lê di nav cîhana rojavayî de perwerde dîtibû. Li gor wî sirgûniya wî tiştek baş bû lewra bi rêya sirgûnê herdu cîhanan jî dikaribû fêm bikirana. Em heman tiştî di cîhana edebî ya Pîrbal de jî dibînîn. Herçend ew rexneyan li hember çanda ewropiyan bike jî di heman demê de heyranî vê çandêyê ye jî.

Di *Santiago de Compestela*[3] de li gor karakterê sereke Dara, Ewropa cihê şaristaniyê ye. Ew dema ku digihêje Îspanyayê şaş dimîne ka çawa Îspanya piştî ew qas şer û pevçûnan cihên xwe yên kevnare û dîrokî parastiye (Pîrbal, 2013, 89). Bajarên Ewropayê her yek di nav xwe de çand û hunereke qedîm dihewîne. Ewropê di heman demê de warê felsefeyê ye jî. Bo nimûne di çîroka "Perawêzên Ewropayê" de Kurdo ji pîrejina Ewropî re dibêje ku em dizanin Ewropa cihê şaristanî û pêşketinê ye (Pîrbal, 2001, 19). Li gor Kurdo, Danîmarka welatê fîlozofê mezin Kierkegaard û hunermend Rimbaud e. Lê digel vê bîr û baweriya xwe ew salek e li Danîmarkayê û êdî di wê baweriyê de ye ku ew welat ne wekî serdema Kierkegaard e (16-17).

Ewropê ligel ku cihê felsefe û edebiyatê ye di heman demê de warê azadiya takekesî ye jî. Em di *Hôtel Europeyê* de rastî van nîqaşan tên. Li gor Hacîzade ku parêzvanê çanda Îran û Îslamê bû, Ewropa warê azadiyê ye. Ew dibêje bi-

3 Pîrbal berheva navê berhemê Santiago de Compestela nedaniye. Lewra ev bajêr di sala 2000an de wekî navenda çanda Ewropayê hatiye hilbijartin.

zin jî li welatê me ji mirovan azadtir in. Lê Ewropa ne wisa ye mirov azad in di navbera welatan de sînor tunene. Lê li welat ne çûyina welatekî din çûyîna bajarekî din jî gelek zehmet e. Herçend lê li vir jî problemên penaberiyê hebin jî ew azad bû. Beravajî Ewropayê serokê misilmanan welatên wan ji bo gelên xwe kiribûn dojeh (Pîrbal, 2012, 32-33).

Ligel çand û hunera Ewropayê em di nav cîhana wî ya edebî de rastî gelek hunermendên ewropî tên. Bo nimûne Libardo yek ji wan kesan e, bavê wî kolombî diya wî portekîzî ye li Parîsê dijî hunermendê fotogiriyê ye. Kamera li ser milê wî ye û li her kolanê wêneyan digre, ji bo galeriyan kar dike (Pîrbal, 2013, 97). Filip li Parîsê xwediyê galeriyeke navdar e (64). Oraiana Erno hevala Dara ye. Wê bi xaça sor re kar kiriye û gelek senaryo û roman nivîsîne. Li ser hunera îdealîst ew û Dara nîqaşan dikin. Monsieur Luciana li zanîngeha Sorbonneê di beşa îrannasiyê de doktorayê dike. Ew gelek ji çanda rojhilat bi taybetî jî çanda Îranê hez dike û farisî baş dizane. Teza xwe ya doktorayê li ser bandora helbesta fransiz li ser şairê mezin yê Îranî Nîma Yusîç dinivîse (Pîrbal, 2012, 76-77). Di *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* de Margirêt keçeke fransiz e ku Ferhad evîndarê wê bûye. Ew akademisyen e di heman demê de ji hunere jî hez dike (Pîrbal, 2014, 32).

Di nav dîtina Ewropayê de berhema herî zêde derdikeve pêş *Santiago de Compestela* ye, jixwe ev berhem li ser alegoriyeke Ewropayê hatiye avakirin. Di vê berhemê de Venus Ewropayê temsil dike. Ji bo karekterê sereke Dara, Ewropa warê hunere ye, ew li Parîsê wênesaz e û bi xêra vî karî debara xwe dike. Lê ev kar li Kurdistanê pere nake lewra kurd qîmetê nadin hunerê û wêneyên wî. Heger li Kurdistanê bûna kesî bi du qirûşan jî wêneyên wî nedikerî lê Parîs ne wiha bû ev der warê hunere bû (Pîrbal, 2013, 25). Jixwe wî jî wekî penaberên din ji bo xeyalên xwe berê xwe dabû Ewropayê. Ji bo wî Ewropa wekî jineke ciwan bû lewra her dem dixwest xwe bigihijîne vê derê; lê dema ku gihîştê fêm kir ku rastî û xeyal ne wek hev in. Venusa ku ew di xewneşevekê de dîtibû mîna Ewropayê xeyalek bû. Dema ku li pey vê xeyalê çû û gihaşt Santiago de Compestelayê dît ku Venus pîrejinek e. Gelek ciwanên wekî wî ketibûn pey vê xeyalê û hatibûn Santiago de Compestelayê lê êdî Venus bûbû pîrejinek (160). Venus mîna sihirbazeke tê xewnên ciwan û hunermandan û wan aşiqî xwe dike (143). Ew jî wekî Ewropayê derew e, çirav e, xeyal e. Dara ji bo hatina xwe poşman dibe û ji ber vê ligel nebaşiya rewşa welat her dem fikara vegerê dike. Hevalê wî Behcet ji vê fikra wî aciz dibe û dibêje ev tiştê ku tu bêriya wî dikî ne Kurdistan e, fikra Kurdistanê ye. Dara bersiva wî dide û dibêje ev tiştê ku tu jê hez dikî jî ne Ewropa ye, fikra Ewropayê ye (35).

4. Ewropaya Oryantalîst

Di cîhana edebî ya Pîrbal de aliyekî oryantalist yê Ewropa û ewropiyan jî heye. Oryantalîzm di dîrokê de bi giştî helwesta Ewropayê li hember Rojhilatê temsil dikir. Lê di vî warî de gelek têgihiştinên ji hev cuda derketin holê. Hinan ji wan oryantalîzm wek dijminahiya li hember Rojhilatê teswîr dikir û ji bo vê bîr û baweriya xwe piştrast bikin jî *Oryantalîzma* Said bi kar dianîn. Lê Said (2013, 346) bixwe jî ji têgihiştinên bi vî rengî aciz e çimkî ew behsa hişmendiya oryantalist dike lê nabêje oryantalîzm bi tevahî dijminahiya Rojhilat e. Ew di xebata xwe de hewl dide awayên cuda yên oryantalîzmê raxe ber çavan; lê beravajî vê armancê, îddîayên wî ji aliyê ereban ve weke parastina Rojhilat hatin xwendin.

Di rastiya xwe de oryantalîzm serê ewil wekî zanisteke akademîk bû ku dixwast di derbarê Rojhilatê de agahiyan hilberîne. Lewra weku Saîd jî îfade dike oryantalîzm ne dijminahiya Rojhilatê ye. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku hemû oryantalist jî ne dijminê gelên rojhilat bûn. Lê berevajî vê yekê ji bo hin oryantalîstan Rojhilat ew der e ku divê bê dagirkirin û di heman demê Rojhilat tê wateya ruhaniyetê, hevaltî û dostaniyê. Ew cihekî egzotîk e ku em dê van yekan di berheman Pîrbal de bibinin. Nimûneya yekemin a hişmendiya oryantalîst ya bi vî rengî di *Penaberekî Fransî Li Kurdistanê* de tê dîtin. *Christophe* rojnamevanekî fransiz e. Ew hatiye Kurdistanê da ku hîn bibe ka ji bo çi kurd berê xwe didin Ewropayê (Pîrbal, 2015, 8-9). Li vir rastî Şehrazad tê û evîndarê wê dibe. Christophe dibêje ku hemû tiştên wî hene lê tenê tiştek kêm e ew jî xoşewîsta wî ye. Li Ewropa û Amerîqa her tişt heye lê hezkirin kêm e (27-28). Li gor wî Kurdistan cihekî egzotîk e. Erê hatiye ji bo lêkolînê lê li vê derê ji bo xatirê Şehrazadê hewl dide kurdî hîn bibe (31-33). Şehrazad xewn û xeyalên Christophe dixemilîne (45). Lê Şehrazad nikare bersiva evîna Christophe bide. Ji ber ku heger birayên wê bibihîzin ew ê ji bo wê gelek nebaş be. Kurd civakek feodal in, evîn li van deran bi aşkerayî pêk nayê (64). Şehrazad bi birayên xwe bi rêzikên eşîrî ve girêdayî ye. Christophe jî mîna yekî xelasker hatiye ku wê ji vê sîstema feodal xelas bike. Çûyina Ewropayê ji bo Şehrazadê rêya felatê ye (70). Ev têgihîştin gelek caran di hişmendiya oryantalîstan de cih digire. Rojhilatî feodal û barbar in û jinên wan divê ji bin desthilatdariya feodalîtayê bên xilaskirin. Ev rewş li gelek deverên cîhanê jî wisa ye. Bo nimûne, Spivaka (2016, 16) ku rexnegirek femînîzma postkolonyal e, li ser vê yêkê nîqaş dike û dibêje; rojavayî ji ber tevgerên wan yên li hember jinên rojhilatî mêrên rojhilatî wekî kesên feodal teswîr dikin. Lewra li ser navê jinên rojhilatî diaxivin.

Em van tiştên ku li jor hatin behskirin di *Hôtel Europeyê* de jî dibinin. Luciana gelek dewlemend e û dil berdide keçeke Îranî bi navê Zîbayê. Digel ku ew jê re dibêje ew ê hemû mal û milkê xwe li ser wê çêbike jî Zîbayê vê yekê qebûl nake û vedigere Îranê çimkî ew ê malbata wê tu carî qebûl neke ku ew bi yekî cihû re bizewice (Pîrbal, 2012, 141). Ev tişt gelek caran di nav edebiyatên cîhanê de têne dîtin. Jinên welatên cîhana sêyemîn di bin pêkûtiya mêrên feodal de ne û mêrêkî çermspî ji bo ku van jinan ji bin destilatdariya mêran xelas bikin derdikeve holê. Di vê senaryoyê de jî heman tişt heye. Erê Christophe nikare Şehrazad bigire û biçe, lê ji bo evîna wê amade ye ku li Kurdistanê bibe penaber (Pîrbal, 2015, 67).

Li gor têgihîştina oryantalîst, rojhilatî bi taybetî jî misilman di derbarê fikra azadiyê de tu tiştekî nizanin. Fikrên bi vî rengî ji wan dûr in (Said, 2013, 184). Rojhilatî mirovên reben in û nikarin xwe bi rê ve bibin (219). Ev gotar jî di berhemên navborî de têne dîtin. Digel aliyê egzotîk yê Kurdistanê, Christophe dilê xwe, bi halê bêzar yê Kurdistanê dişewitîne, li vî welatî hilberînî tuneye hemû xelk ji ber birçîtî û belangaziyê berê xwe didin Ewropayê. Heta hin eşîr hene ku bi tevahî dev ji welatê xwe berdane û çûne Almanyayê. Ev der welatekî paşvemayî û kavil e (Pîrbal, 2015, 36-37). Christophe ji ber van sedeman ji Rebwar re dibêje ku kurd divê Ewropaya xwe ava bikin (43).

Aliyekî din yê oryantalîzmê jî ew e ku rojhilatî ji bo wan tenê çavkaniyeke agahiyan in (Said, 2013, 324). Ji ber vê jî em di cihana edebî ya Pîrbal de gelek caran rastî ewropiyan tên ku ew bi awayekî profesyonel li ser Rojhilat kar dikin. Bo nimûne Margirêt keçeke fransiz e ku Ferhad evîndarê wê bûye. Ew oryantalîst e, li Zanîngeha Moskovayê di beşa komelnasiyê de li ser jinên rojhilatê teza doktorayê dinivîse. Bakelaryoya xwe ji enstîtûya zimanê rojhilatî di beşa erebî de girtiye. (Pîrbal, 2014, 32). Bi heman awayî Lucina li Zanîngeha Sorbonnê di îrannasiyê de lêkolerê herî çalak û berhemdar e (Pîrbal, 2012, 137). Ew herdu jî li ser rojhilat kar dikin û hewl didin di derbarê rojhilat de agahî hilberînin. Bi taybetî jî Margiret li teswîra Spivak tam rûdine. Ew weke jineke çermsipî hewl dide îspat bike ka çawa jinên rojhilatî ji aliyê dewletên rojhilatî hatine kolekirin û ji bo berjewendiyê van dewletan hatine bikaranîn. Rojavayî zana ne û hewl didin ku rojhilatiyan ji bin zilm û zordestiya mêrên feodal xelas bikin. Rojhilatî jî bi tenê dikarin Rojavayê teqlîd bikin. Di vê mijarê de li gor Saîd (2013, 171) oryantalist dikare rojhilatiyan teqlîd bike; lê rojhilatî nikarin heman tiştî bikin. Ji bo oryantalîstan rojhilatî tenê bireser in. Bo nimûne, em di *Santiago de Compestela* de dibinin ku Oriana bi şêweyekî oryantalîst nêzikî Dara dibe û dixe bîra wî ka ew ji ber çi hatiye Ewropayê (Pîrbal, 2013, 56). Bi heman awayî em di çîroka *Perewazên Ewropayê* dibinin ku pîrejina ewropî bi awayek oryantalîst ji Kurdo re dibêje, hûn jî ji xwe re Ewropaya xwe çêkin (Pîrbal, 2001, 19). Ji ber ku Kurdo bê welat e ew nikare bibe mîna yekî ewropî. Ji ber van sedeman mirov dikare bibêje ku di cihana edebî ya Pîrbal de aliyekî oryantalist yê îmaja Ewropa û ewropiyan heye. Hin ji wan Rojhilat weke cihekî egzotîk hin ji wan jî wekî cihekî paşvemayî dibînin. Heta hin kesên wekî Margiret bi awayeke profesyonel li ser Rojhilatê kar dikin ku ew ji aliyê akademîk ve jî oryantalîst bûn. Lê wekî me berê jî behs kir ji bo van oryantalîstan Rojhilat warê evîndariyê ye û ji ber vê jî gelekan ji wan dixwastin berê xwe bidin Rojhilat û li wir rastî evîna rasteqîn bihatana lewra ewropî bêruh û hedonîst bûn û tenê li pey kêfa xwe bûn.

5. Ewropaya Bêruh û Hedonîst

Li gor oryantalîstan, Rojhilat xwedî ruh bû. Bi heman awayî oksîdantalîst jî di wê baweriyê de bûn ku Rojava ji aliye aborî, sîyasî û teknolojik ve pêşketî ye lê bêruh e fêm nake ka gelo ji bo mirovahiyê çi giring e (Buruma û Margalit, 2004, 75). Okdîdentalist dijberî nirx û modernîteya Rojava ne. Lewra ew takekes e û xwedî rasyonalîzmek bêruh e. Beravajî vê yekê li rojhilat qîmeta nirxên çandî û malbatê heye. Erê, Rojava xwedî aqil bû lê Rojhilat jî xwedî giyan bû (Jouhki û Riekka Pennanen, 2016, 4). Ji ber van sedeman e ku gelek caran di hişmendiya rojhilatiyan de bi taybetî jî di nav rabêja rewşenbîrên rojavayiyan de Rojava wekî bêruh dihate dîtin. Rojava nexweş e û çanda wê xera bûye Ewropî tev materyalîst in û ew şaristanî dê rojekî ew ê hilweşe (Bonnett, 2004, 79-83). Bi heman awayî li gor Buruma û Margalit (2004, 10) oksîdentalîst di wê baweriyê de ne ku hemû gelên rojava wekî mirovên bêruh, bêşeref, bêesil û bêbawerî ne. Bi taybetî jî di çavê oksîdentalîstên dîndar û marksîst de, rojavayî tenê qîmetê didin pere û eşyayê (110). Di nav vê çarçoveyê de metropolên Rojavayê yên wekî New York, Parîs, Berlîn û Londrayê ji bo oksîdentalîstan bajarên bêruh in, sembola xerabiyê ne û bajarên bêxweda ne (21). Ev bajar di heman demê de warê oksîdentalîstan in. Bi gotineke din gelek oksîdentalîst li wan bajaran dijîn û van bajaran wekî bajarên bêruh pênase dikin. Bo nimûne em li bajarên wekî Parîs mirovên antî kolonyal, antî emperyalist yên wekî serokê rejima Pol-Pot Khmer Rouge û Frantz Fanon dibînin. Ew nîştecihê van bajaran bûn û li gor wan ev bajar maka xerabiyê bûn (43). Hin aliyên heqdar yên van îddiayên oksîdentalîstan hebûn çimkî ewropiyan bixwe jî Ewropa li gora aqil modernîte û sekuleriyê ve pênase dikir. Ev parametreyên sereke yên Rojava bûn ku rojavayî bi xwe jî ji van parametreyan aciz bûn û berê xwe didan rojhilat. Bo nimûne di *Santiago de Compestelayê* de Lîbardo ji ber ku li Ewropayê Xwedê nemaye dixwaze biçe Hîndistanê. Ew dixwaze li Hîndîstanê di bin siya xwedawendan de bijî. Dara li dijî vê baweriya wî derdikeve, li gor wî li Îranê û Iraqê jî Xweda heye lê li van deran tu aramî tuneye. Li gor Lîbardo ruhaniyet û sozdarî

tenê li rojhilat maye. Dara bersiva wî dide û dibêje belkî ev gotinên wî ji bo sedsala 19. rast bin lewra romantikên Ewropî bi qeflan berê xwe didan Rojhilat lê ev yek ji bo niha ne derbasdar e (Pîrbal, 2013, 98).

Bi heman awayî di *Penaberekî Fransî Li Kurdistanê* de li gor Christophe, bextewarî ne li Ewropayê li hemû derên cîhanê ye; lê li Kurdistanê mirov bextewartir in (Pîrbal, 2015, 75). Ji ber vê, ew jî dixwaze li Kurdistanê bibe penaber. Di *Hôtel Europe* de Luciana ji çanda Îranê gelek hez dike. Lewra helbestên Hafiz, Mewlana, Xeyam, Nîma Yusîç û Firûxzad ji ber kiriye lewra ew xîtabî giyana mirov dikin (Pîrbal, 2012, 96). Di çîroka *Perwazên Ewropayê* de li gor pîrejina ewropî Danimarka welatê tenhayî û bêkesî ye yên ku ew hest li ba wî tunebe ne danîmarkî ye. Li vî welatî xelk xwe ji ber tenhayiyê dikujin. Tenhayî bûye parçeyekî jiyana ewropî û danimarkiyan. Ew ji ber vê tenhayiyê berê xwe didin Asya û Afrîkayê û bi taybetî jî ber bi Rojhilata Navîn diçin (Pîrbal, 2001, 17). Ewropî digel ku bêruh in di heman demê de hedonîst in jî ew tenê li pey kêfa xwe digerin ku ev yek di vê çîrokê de jî xwe dide der. Ewropî dikevin pey penaberên bêçare da ku wan ji xwe re bikin pêlîstokên seksê. Di vê çîrokê de jî Kurdo digel ku li ber xwe jî dide, di encamê de mecbûr dimîne wekî her penaberî bi pîrejineke Ewropî re bizewice (13-14). Em heman rewşê di *Hôtel Europe* de dibînin. Homoseksuel li San Fransiscoyê gelek in. Kafeyeke bi navê The Cellar heye ev der bi homoseksûelan tije ye û her yek weku li bendî neçîra xwe be li bendî penaberên bêçare ne da ku wan bi xwe re bibin û ji xwe re bikin pêlîstok çimkî li gor wan penaber pariyê erzan in (Pîrbal, 2012, 155).

Encam

Me di vê xebata xwe de hewl da ku em îmaja Ewropî û ewropiyan di berhemên Pîrbal de dest nîşan bikin. Di encama vê xebatê de hate dîtin ku gelek îmajên ji hev cuda yên Ewropa û ewropiyan di berhemên wî de hene. Herçend di navbera kurdan û ewropiyan de paşxaneyek kolonyalîzmên wekê gelên efrîqî û asyayî de tunebe jî îmaja kolonyal û emperyalîst di berhemên Pîrbal dê tê dîtin. Lê divê were gotin digel vê îmajeke erênî ya Ewropa û ewropiyan jî di berhemên wî de heye. Herçend ev taybetiya xwe wenda kiribe jî Ewropa cihê zanist û hunerê ye. Pîrbal aliyê oryantalist yên Ewropa û ewropiyan jî radixe ber çavan. Lê ev alî divê were gotin ku bi tevahî ne neyînî ye. Ewropa û ewropî di heman demê de bêruh û hedonîst in ji ber vê jî gelek ji wan di berhemên Pîrbal de ji bo jiyanek çêtir berê xwe didin rojhilat.

Çavkanî

Ahiska, Meltem. *Occidentalism in Turkey: Questions of Modernity and National Identity in Turkish Radio Broadcasting.* London û New York: I.B. Tauris, 2010.

Ahiska, Meltem. Occidentalism: The Historical Fantasy of the Modern. *The South Atlantic Quarterly, 102*(2), 351-379, 2003.

Aydın, Cemil. *The Idea of Muslim World, A Global Intellectual History.* London: Harvard University Press, 2017.

Ağdal, Meki. *Di Romanên Ferhad Pîrbal de Şopên Bêciwariyê.* Van: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, 2022.

Baldick, Chris. *The Concise Oxford Dictionary of Literary Terms.* New York: Oxford University Press, 2001.

Bavli-Özek, Kübra. *Self-Oryantalîzm An Jî Oksîdentalîzm? : Temsîla "Rojava" ("Occident") Di Fîlmên Kurdî De.* Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi, 2021.

Bonnett, Alastair. *The Idea of The West Culture, Politics and History.* New York: Palgrave Macmillan, 2004.

Burma, Ian. Oksidentalizmin Kökenleri. *Cogito*(40), 278-286, 2004.

Buruma, Ian, & Margalit, Avishai. *Occidentalism The West in The Eyes of It's Enemies.* New York: The Penguin Press, 2004.

Carrier, James G. Occidentalism: The World Turned Upside-down. *American Ethnologist, 19*(2), 195-212. https://www.jstor.org/stable/645033, 1992.

Carrier, James. G. *Occidentalism Images of the West.* Oxford: Clarendon Press, 2003.

Coronil, Fernando. Beyond Occidentalism: Toward Nonimperial Geohistorical Categories, *Cultural Anthropology, 11*(1), 51-87. https://www.jstor.org/stable/656209, 1991.

Culler, Jonathan. *Yazın Kuramı.* (H. Gür, Wer.) Ankara: Dost, 2007.

Eliade, Mircea. *İmgeler Simgeler.* (M. Kılıçbay, Wer.) Ankara: Gece,1992.

Elsherif, Amr. Occidentalism and Cultural Identity. *International Journal of Postcolonial Studies*, 621-639. doi:https://doi.org/10.1080/1369801X.2014.984616, 2015.

Engin, Ertan. İmagology. *Selçuk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*(27), 57-66. https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/151793 adresinden alındı, 2012.

Fanon, Frantz. *Yeryüzünün Lanetlileri.* (L. F. Topaçoğlu, Wer.) İstanbul: Avesta, 2007.

Fanon, Frantz. *Siyah Deri Beyaz Maske.* (C. Koytak, Wer.) İstanbul: Versus, 2009.

Findley, Carter Vaughn. An Ottoman Occidentalist in Europe: Ahmed Midhat Meets Madame Gulnar. *The American Historical Review, 103*(1), 15-49,. https://www.jstor.org/stable/pdf/2650772.pdf?refreqid=fastly-default%3A591ef0c6d7fc3847c3b6382e7460047b&ab_segments=&origin=&initiator=&acceptTC=1, 1998.

Florack, Ruth. French. M. Beller, & J. Leerssen (Dü) Di nav, *Imagology The cultural Construction and Literary Representation of National Characters* (s. 154-159). Amsterdam-New York: Radopi, 2007.

Fukuyama, Francis. *The End of History*. 3 25, 2020 tarihinde www.emble.de.: https://www.embl.de/aboutus/science_society/discussion/discussion_2006/ref1-22june06.pdf, 1989.

Göktaş, Melahat. *Mehmet Uzun Romanlarında Türk İmgesi* . İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi, 2022.

Girard, Rene. *Romantik Yalan ve Romansal Hakikat, Edebi Yapıda Ben ve Öteki.* İstanbul: Metis Yayınları, 2013.

Hanefi, Hasan. İslam ve Batı: Çatışma mı Diyalog mu? *Cogito*(40), 2004.

Hegel, Georg Friedrich. *Tinin Görüngübilimi.* (A. Yardımlı, Wer.) İstanbul: İdea Yayınevi, 1986.

Huntington, Samuel. P. The Clash of Civilizations? *Foreign Affairs, 72*(3). url: http://www.jstor.org/stable/20045621, 1993

Jouhki, Jukka., & Riekka Pennanen, Henna. The Imagined West: Exploring Occidentalism. *suomen antropologi, 41*(2), 1-10, 2016.

Kan, Güneş. *Îmaja Ermenî Di Romanên Kurdî Yên Sovyetê De.* Stenbol: Peywend.

Kearney, Richard. *Yabancılar, Tanrılar ve Canavarlar Ötekiliği Yorumlamak.* (B. Özkul, Wer.) İstanbul: Metis, 2012.

Laetitia, Nanquette. *Orientalism Versus Occidentalism Literary and Cultural Imaging between France.* London and New York: I.B. Tauris, 2013.

Leerssen, Joep. Image. M. Beller, & Leersen (Amd.) di nav, *Imagology The cultural Construction and Literary Representation of National Characters* (s. 342-345). Amsterdam-New York: Radopi, 2007.

Lenoir, Beatrice. *Sanat Yapıtı.* (A. Derman, Wer.) İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 2002.

Massad, Joseph. Orientalsim as Occidentalism. *History of the Present*, 83-94, 2002. https://www.jstor.org/stable/10.5406/historypresent.5.1.0083, 2015

Memmi, Albert. *The Colonizer and the Colonized.* (H. Greenfeld, Wer.) London: Earthscan 2003.

Metin, Abdullah. *Oksidentalizm: İki Doğu İki Batı.* İstanbul: Açılım Kitap, 2013.

Metin, Abdullah. Occidentalism: An Eastern Reply to Orientalism. *Bilig*(93), 181-202, https://bilig.yesevi.edu.tr/shw_artcl-2335.html, 2020.

Mohammed, Eid. *Arab Occidentalism_Images of America in the Middle East.* London û New York: I.B. Tauris, 2015.

Ning, Wang. Orientalism versus Occidentalism? *New Literary History, 28*(1), 57-67. https://www.jstor.org/stable/20057401,1997.

Pîrbal, Ferhad. *Çolistan.* (Ş. Salih, & F. Kelehkî, Wer.) İstanbul: Avesta, 2001.

Pîrbal, Ferhad. *Hôtel Europe.* (B. Mistefa, Wer.) Stembol, 2012.

Pîrbal, Ferhad. *Santiago de Compestela.* (B. Mistefa, Wer.) İstanbul: Avesta, 2013.

Pîrbal, Ferhad. *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr.* (Ç. Zêdo, Wer.) Istanbul: Avesta, 2014.

Pîrbal, Ferhad. *Penaberekî Fransî Li Kurdistanê.* (I. Farqînî, Wer.) Istanbul: Avesta, 2015.

Said, Edward Wadie. *Şarkiyatçılık Batı'nın Şark Anlayışları.* (B. Eyüpoğlu, O. Koçak, Dü, & B. Ülner, Wer.) İstanbul: Metis, 2013.

Said, Eward Wadie. *Kültür ve Emperyalizm.* (N. Alpay, Wer.) İstanbul: Hill, 2016.

Salhi, Zahia Smail. *Occidentalism Literary Represantations of the Maghrebi Experince of the East-West Encounter.* Great Britain: Edinburgh University Press, 2019.

Spivak, Gayatri Chakravotry. *Madun Konuşabilir mi?* (E. Koyuncu, Wer.) Ankara: Dipnot, 2016.

Tonneson, Stein. Orientalism, Occidentalism and Knowing about Others. *Nordic- European Workshop in Advanced Asian Studies*, (s. 15-18). Copenhagen. https://www.cliostein.com/documents/1994/94%20orientalism%20niasnytt.pdf,1993.

Turner, Bryab. S. *Oryantalizm, Postmodernizm ve Globalizm.* (İ. Kapaklıkaya, Wer.) İstanbul: Anka, 2003.

Venn, Couze. *Occidentalism Modernity and Subjectivity.* Goldsmith: Sage, 2000.

Yavuz, Hilmi. *Modernleşme, Orynatalizm ve İslam.* İstanbul: Boyut Kitapları, 1998.

Extended Abstract

The problem of otherness is often addressed in literature. Occidentalism as a way of seeing the other is a new approach in this respect, yet it is an important tool used in literary studies. Although Occidentalism is often seen as the opposite of orientalism, it is greatly a different and complex ideology from orientalism. The main reason is that Occidentalism takes different forms in different parts of the world. There are three mainstream occidental approaches. According to the first approach, Occidentalism is a science that studies the west. Until now, the West has always tried to define the East, but thanks to Occidentalism, easterners can now define the West, which is positive for both worlds. In terms of the second approach, Occidentalism is based entirely on hostility to the West. For the third approach of Occidentalism, one can still be a westerner by preserving the values of the east. In this view, the West has a positive image. However, it is possible to see different Occidentalisms such as Turkish Occidentalism, Arab Occidentalism, Chinese Occidentalism, etc., due to the fact that each nation has its own way of seeing the West. There are quite a number of academic studies on these occidental understandings. Although, it is an important question whether we can speak of a Kurdish Occidentalism, academic studies in this field are quite limited. At the same time, there are few studies on how Occidentalism is treated in Kurdish literature because the Kurds have no direct contact with Europe and its peoples. However, this situation changed when Kurds were forced to migrate to western countries, especially European countries, due to their own historical and social traumas. The Kurds are an important diasporic community in countries such as Germany, France, Sweden and the UK. The problems the Kurds face in European countries are reflected in their literature. However, in this literature, which we can call diaspora or immigrant literature, we are witnessing the gradual emergence of the image of Europe and Europeans along with the problems experienced by immigrants. In this framework, Ferhad Pîrbal is probably one of the most prominent writers who have intensively used the image of Europe and Europeans in his works. Pîrbal is an important writer in Kurdish literature. In addition to being a prolific writer, he is also a painter and actor. He spent many years of his life in Europe and received a doctorate at the Sorbonne University. Pîrbal, who has an important place in Kurdish literature as an academic and artist, has also been subjected to attacks from time to time for being critical of Kurdish society. Pîrbal also criticizes Europe and European society in his works. In this respect, this study aims to show how the image of Europe and Europeans appears in Pîrbal's works based on the discussions on Occidentalism. In this framework, his works translated into Kurmanji dialect of Kurdish were analyzed. As a result, it has been observed that there are quite different images of Europe and Europeans in his works. In his works, Europe and Europeans have been described as colonialist and imperialists. Europeans are portrayed as those who do not care about the peoples of the Middle East, but only support totalitarian regimes for their own interests and make these peoples suffer. Because of all these actions, European cities are full of refugees. As modern slaves, refugees have no choice but to be the sex toys of Europeans. In addition to this negative image, Europe is also seen as the center of science and art. In particular, Santiago de Compestela is an allegory of Europe. In this work, Pîrbal tries to show how Europe is a utopian place for many people, but in reality it is full of disappointments. Europe and Europeans also have an orientalist image. Many Europeans who are interested in his works are those who are interested in Eastern culture or who are doing academic studies on this culture. For these people, the East is an exotic place to be seen. For this reason, they travel to the East. While the East is portrayed as exotic and full of emotions, Europe is portrayed as a soulless geography. In this regard, Europeans are portrayed as people who pursue their pleasure. European cities are cities of individualization and isolation. In these cities, old and lonely people use desperate refugees to satisfy their own desires. Despite all these negative aspects, Europe is still the center of modernity in his works, and for this reason, the idea that Kurds should also build their own Europe often comes to the fore in his works.